
Helsedirektoratet

Direktoratet for medisinske produkter

DSA Direktoratet for strålevern og atomsikkerhet

# Bikaranîna hebikên yodê di dema qezaya atomî de




Ma gelo temenê te li jêra 40 salî ye, yan tu ducanî yî, tu şîr didî zarokan an zarokên te li malê dijîn? Eger rewşa te yek ji van be em pêşniyar dikin ku li mala we hebikên yodê hebin. Di bûyera qezaya atomî de hebik dikarin li dijî yoda radyoaktîf we biparêzin, û divê hebik tenê li ser şîreta rayedaran werin bikaranîn.

**Çima pêwiste mirov hebikên yodê bixwe?**

Di bûyereke qezaya atomî de, yoda radyoaktîf dikare di hewayê de belav bibe û derbasî livika zengilokî (skjoldbruskkjertel) dibe dema ku mirov hewaya qirêj distîne û/an xwarin û vexwarina gemarî dixwe û vedixwe. Hebiken yodê girtina yoda radyoaktîf a di livika zengilokî de asteng dike û xetera pêşkeftina penceşêra (kansera) livika zengilokî kêm dike. Hebikên yodê tenê li hember yoda radyoaktîf mirov diparêze, û ne li hember madeyên din ên radyoaktîf.

Dê bi gelemperî şîreta bikaranîna hebikan li gel şîreta mayina li hindur heya 2 rojan were dayîn. Ji ber vê yekê girîng e ku hebikê yodê li malê werin hilanîn.

**Divê kengî hebik bêne xwarin?**

Divê ew tenê li ser şîreta rayedaran bêne xwarin. Di bûyera qezayeke atomî de, dê şîret bi riya medya, rayedarên têkildar û www.dsa.no werin dayîn.

**Kî divê hebikên yodê bixwe?**

Bi taybetî girîng e ku zarok û ciwanên di bin 18 salan re, jinên ducanî û jinên ku zarokan şîrdidin hebikên yodê bikarbînin ji ber ku piştî lêrastbûna yoda radyoaktîf, ew in yên ku herî zêde xetera peydabûna penceşêra livika zengilokî li ser wan heye.

Di rewşên pir taybetî de, dibe ku karanîna hebikan minasib be ji bo mezinên di navbera 18 û 40 salan de, lêbelê yên ji 40 salî mezintir in, xetereke pir piçûk a nexweşiya penceşêrê di livika zengilokî (xidde dereqiyye) de li ser wan heye, û ne hewce ye ku ew hebikên yodê bixwin. Kesên ku emeliyat bûne û livika zengilokî li cem wan hatiye rakirin, hewce nake ku ew hebikên yodê bixwin.

Rayedar dê bêtir şîretan bidin li ser ka kîjan komên civatê divê di bûyera qezaya atomî de hebikan bistînin.

TÊBÎNÎ! Pêdivî ye ku di dema çêbûna qezaya atomî de hebikên yodê bi îzafeyên xwarinê yên di wan de yod heye re neyên tevlihev kirin.

Ger ji te re pêdivî ye ku tu rojane izafeyên xwarinê yên bi yodê bikarbînî, wek nimûne di dema ducaniyê de, ji dermanxaneyê pirsa vê bike.

**Kaliumjodid SERB (65 mg)**
**Divê mirov çiqas Kaliumjodid SERB (65 mg) bistîne?**

**Her kesên ji 12 salî mezintir, jinên ducanî û jinên şîr didin zarokan: 2 hebik (= 130 mg)**
Hebik bi gelek av an vexwarineke din re têne daqurtandin. Ger hewce be, hebik dikare were cûtin, dabeşkirin an pelçiqandin û di nav ava fêkî, reçelê, şîr an tiştekî wekî wan de were tevlihev kirin.

**Zarokên 3-12 salî: 1 hebik (= 65 mg)**
Hebik bi gelek av an vexwarineke din re tê daqurtandin. Ger hewce be, ew dikare were cûtin, dabeşkirin an jî pelçiqandin û li ser kevçîyekî ji mast, reçel an jî xwarinên din ên nîv hişk were dayîn, an jî di nav avê de were tevlihev kirin.

Helandina hebikan di nav avê de: Hebikê têxe qedehekê, piçek av lê zêde bike (miqdarekî ku zarok dikare vexwe). Nêzîkî 2 deqîqyan tev bide, hebik bi tevahî nahele, lê xem nake. Doza derman bide zarokê. Pişt re gelek vexwarinê bide zarokê.

**Zarokên 1 mehî – 3 salî: ½ hebik (= 32,5 mg)**
Hebikê bike du nîv. Nîv (½) hebikê bide zarokê. Hebik dikare were cûtin, an jî pelçiqandin û li ser kevçîyekî ji mast, reçel an jî xwarinên din ên nîv hişk were dayîn, an jî di nav avê de were helandin.
Helandina hebikan di nav avê de: Nîv (½) têxe qedehekê, piçek av lê zêde bike (miqdarekî ku zarok dikare vexwe). Nêzîkî 2 deqîqyan tev bide, hebik bi tevahî nahele, lê xem nake. Doza derman bide zarokê. Ger zarok nikaribe ji qedehê vexwe, sirincê an kevçîyekî bikar bîne. Piştre gelek vexwarinê bide zarokê.

**Zarokên li jêra 1 mehê: ¼ hebik (= 16,25 mg)**
Hebikê li ser çar beşan parve bike. Çaryeka (¼) hebikê têxe qedehekê, piçek av lê zêde bike (nêzîkî 2-2,5 ml an jî kevçîyekî çayê tije av wê têr dike). Nêzîkî 2 deqîqeyan tev bide, hebik bi tevahî nahele, lê xem nake. Doza derman bi sîrincê an kevçî bidin zaroke. Pişt re gelek vexwarinê bide zarokê.

**Heman doz tê dayîn bêyî berçavgirtina ka zarok tê şîrdan an na.**

Amûrên pêwîst: Hun dikarin sirincên pîvana dozan li dermanxaneyekê bikirin, yan jî hun dikarin kevçîyekê çayê bikar bînin.
Di rewşên normal de, piştî dayîna yodê, ne hewce ye ku zarok ji aliyê doktor ve were muayene kirin, lê heke tu di derbara rewşa tenduristiya zaroka xwe de bi guman bî, divê tu zaroka xwe bibî cem doktorekî giştî. Ev jî ji ber ku li cem zarokên nûbûyî (0-1 meh) ku hebikên yodê xwarine, metersiya metabolîzma kêm zêdeye.
Ji bo zarokên ku berî wextê xwe ji dayik dibin, bi gelemperî hebikê yodê ji wan re nayên pêşniyar kirin berî derbasbûna hefteya 37an a ducaniyê.

**Hebikên yodê bikar neynin:**

- eger alêrjiya te ji kaliumjodid er an ji malzemeyên din ên derman re hebe (di kaxeza pakêtê de hatiye destnîşankirin)

**Pêdivî ye ku ev kes hebikên yodê bixwin, lê divê paşê ji hêla bijîşk ve werin şopandin**

- eger tu bi nexweşiyeke metabolîk ketibe, divê tu piştî 6-12 heftiyan ji xwarina hebikên yodê testên metabolî kontrol bikî.
- eger tu ducanî yî û nexweşiyeke metabolîk bi te re heye, divê di dema ducanîbûnê de metabolîzma te were şopandin, cara yekem piştî 2 hefteyan.
- heke te nexweşiya kulbûna çerm a şikilhêrpêsî (dermatitis herpetiformis (nexweşiya Duhring) hebe, dibe ku di wextê piştî xwarina hebikên yodê de nexweşiya çerm li cem te xirabtir lê were, û bijîşkê te dikare hingî dermankirina te sererast bike.